Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :988 | 17-Tebax- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Wêneyên fermandaran xêz kirin

**Çend hunermendan li ser hin parçeyên dîwarên avayiya Navenda Têkiliyan ya Til Temir, wêneyên fermandar û şervanên şehîd xêz kirin.**

Ji bo bîranîna şehîd Sosin Bîrhat, Rênas Roj, Egîd Girkê Legê, Rûbar Hesekê û Seyfullah Ehmed ên ku di êrişên hewayî yên dewleta Tirk a dagirker de şehîd bûne, Meclisa Leşkerî ya Til Temirê wêneyên wan li ên dewleta Tirk a dagirker yên li dijî rêya Elî Fero û Navenda Têkiliyên Giştî ya Meclisa Leşkerî ya Til Temirê de şehîd bûbûn.

Hejmarek hunermendan li ser hin parçeyên dîwarên avahiya Navenda Têkiliyan a Til Temirê, wêneyên fermandar û şervanên şehîd xêz kirin.

Fermandariya Giştî ya QSD´ê di 20'ê Tebaxa



ser dîwarê avahiya ku hatî bombebarankirin xêz kirin.

Bi nêzbûna salvegera yekemîn a şehadeta fermandar Rênas Roj, Sosin Bîrhat, Egîd Girkê Legê û hevrêyên wan Seyfullah Ehmed û Rûbar Hesekê û ji bo bibîranîna wan, Mec- 2021'ê de ragihandibû ku 19'ê Tebaxê, balafireke bêmirov û biçek a artêşa Tirk a dagirker erebeya fermandarê Yekîneyên Parastina Gel (YPG) Rênas Roj hedef girtiye û di encamê de heval Rênas şehîd bû. Heman rojê tam saet 6:00'an êvarê, artêşa Tirk



lisa Leşkerî ya Til Temirê li navçeya Til Temirê ya kantona Hesekê hejmarek hunermend erkdar kirin da ku wêneyên wan şehîdan li ser dîwarên avahiya ku hatiye bombebarankirin, xêz bikin.

19'ê Tebaxê salvegera yekemîn a şehadeta wan fermandar û şervanan e yên ku di encama du êrişên balafirên bêmirov ên biçek a dagirker li dijî navenda Meclisa Leşkerî ya

Til Temirê êrişeke hewayî pêk anî. Di encama êrişê de, endama Meclisa Leşkerî ya Yekîneyên Parastina Jinê (YPJ) û Meclisa Leşkerî ya QSD´ê Sosin Bîrhat û hevrêyên wê Egîd Girkê Legê, Rûbar Hesekê û Seyfullah Ehmed şehîd bûn û sê şervan jî birîndar bûn. ***ANHA***

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Insiyatîf (Fransî) | **1. Selahiyeta dayîna biryaran. 2. Teybetiya kesê dizane biryarên girîng bide: Filankes bi insiyatîf e. Di nava xwe de insiyatîfek ava kirin. Insiyatîf xist destê xwe.** |
| Kanalîzasyon (Fransî) | Di binê erdê de kanalên ku ava vexwarinê, yan jî ava pîs di wan de derbas dibe. Coya binerdî, Karêz. |
| Kongre (Fransî) | Civîna herî bilind ya partî, yan saziyekê ku biryar tê de tên dayîn, yan jî serok tên hilbijartin. |
| Komplo (Fransî) | Plan û projeyên bidizî. Bêbextî, mûamere: Serokên Kurdan tev bi komployan hatin girtin û kuştin. |
| Konsept (Fransî) | Konsept. Plan û projeyên ku gelek xalan di nava xwe de dihewînin: Êrişa ser Eyn Îsa parçeyek ji konsepta dagîrkeran e. |
| Panel (Fransî) | Rûniştin û civîna ji her kesî re vekirî. Yên tevlî dibin tev dikarin nêrîna xwe bêjin: Di tv. de li ser mijara jinan panelek hebû. |
| Pêngav | Destpêkirina karekî girîng, pêşdeçûyîn, çûna bi ser dijberê xwe de. Hemle: Pêngava 15ê Tebaxê ji bo Kurdan pir girîng bû. |
| Semîner (Fransî) | Civîna bi rêveberiya kesekî yan çend kesan, ji bo dayîna zanyariyan derbarê mijarekê de û gotûbêjkirina li serê: Mûhadere. Li ser mijara Neteweya Demokratîk semînerek hat dayîn. |
| Slogan (Fransî) | 1. Gotina kurt û balkêş ku nêrînekê diyar dike û bi hêsanî tê dubarekirin. Durişm: Çalakkeran bi "slogana" Bimire dagîrkerî" dewletên dagîrker şermezar kirin. 2. Gotina ku armanc û amûrên nasnema, civak û rêxistinekê bi awayekî cewher dide nasîn: Slogana filan partiyê ya vê serdemê wiha ye: |
| Statû (Fransî) | 1. Rewşa kesekî, di nava sazî yan civakê de: A. di şaredariyê de dixebite lê statûya wî (karker e, karmend de, berpirs e) ne diyar e. 2. Li welatekî rewşa civakekê di destûrnameyê de: Di destûra Tirkiyê de statûya Kurdan nehatiye diyarkirin. |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | D | ■ | K | Ê | L | ■ | L | E | M |
| 2 | Î | Z | ■ | D | A | D | ■ | D | ■ |
| 3 | D | A | S | Î | ■ | A | M | Û | R |
| 4 | A | L | A | ■ | A | X | ■ | L | ■ |
| 5 | R | ■ | M | E | D | ■ | M | Ê | W |
| 6 | ■ | S | Î | ■ | A | L | Î | ■ | A |
| 7 | J | I | ■ | I | R | A | ■ | Î | N |
| 8 | ■ | N | A | N | ■ | L | Î | S | ■ |
| 9 | H | E | Ş | T | Ê | ■ | Ş | A | M |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | | ■ | | | |
| 2 | ■ | | ■ | | | | | | ■ |
| 3 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 4 | | ■ | | | ■ | | ■ | | |
| 5 | | | ■ | | | ■ | | ■ | |
| 6 | | ■ | | | ■ | | | | |
| 7 | ■ | | | ■ | | | ■ | | ■ |
| 8 | | | ■ | | | ■ | | | |
| 9 | | | | | ■ | | | | |

### ÇEP-RAST

1. Dolbenda tenik a ku jin didin serê xwe... Sarincên avê yên di binê erdê de
2. Orjînal
3. Cama mîkroskopê... Hesinê ku li binê piyê hespan dixin
4. Cejn, eyd... Notayek
5. Li hin herêman şûna 'dayik'ê tê gotin... Tîpên navîn ê "saet"ê
6. Baneşana keserê... Bajarekî me
7. Kurtkirina gotina televîzyonê... Dema mirov şîr bidoşe û dest nedê tebaqeya bi ser dikeve, qeymax
8. Daçekek ku wateyê xurt dike... Cînavka pirsiyariyê ya ku tê wateya; li ku ye?... Genimê hêrandî
9. Tiştên ku ji nifşên berê hatine wergirtin... Çiyayekî me

### JOR-JÊR

1. Navçeyeke Amedê... Daçekek
2. Cure, celeb... Şivika darîn a zirav a ku serî tûj e û bi kevan tê avêtin
3. Notayek... Vexwarina sereke
4. Plakaya navneteweyî ya Îranê... Pêvedana bi hesinekî sincirî... Pirsek di rewşa ne tewandî de
5. Dijbera girînê... Nexweşiyek
6. Dijbera germ... Hejmarên du, çar, şeş, heyşt û hwd.
7. Wekî gijbûna pirça canê ajelan û tiştên wisa... Peyva neyînî... Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyeyê
8. Rojek... Kesê ku ji dewra zarokatiyê derketiye
9. Tiyatro... Notayek

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 988 | 17-Tebax- 2022 | www.ronahi.net/ku/



Riya serkeftinê ya yekane
Dilyar Cizîrî R-4

Divê artêşa tirkî ji Sûrî bê derxistin
Zekî Bedran R-5

Mirin çiye?
Sara Kerem R-6

Weqfa Jina Azad perwerdeya destwerdana lezgîn ji jinan re didomîne. R-2

## DIJMINÊ KURDAN WÊ WINDA BIKE

# 'WÊ TI ÊRIŞ BÊ BERSIV NEMÎNIN'



Ferhad Şamî diyar kir ku sekinandina dewriyeyên hevbeş yên Rûsî û dewleta tirkî planên wan yên hevbeş eşkere dike.

Şamî destnîşan kir ku ev hefteyeke dewleta Tirk a dagirker xwe ji bo êrişeke nû li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê amade dike. Herwiha Şamî da zanîn ku hebûna leşkerên hikumeta Şamê li cihên tên topbarankirin li pêşiya êrişên dewleta Tirk nebû astengî.

Ferhat Şamî banga gel kir û got, dewleta dagirker dixwaze herêmê vala bike. bila ti kes terka cih û warê xwe neke. Herwiha bila gelê me bizanibe ku ti êrişên dewleta tirkî bê bersiv namînin û emê bi gelê xwe re tola van êrişên hov rakin.

Ferhad di gotinên xwe de teqez kir ku yê winda bike wê dijminê kurda be. ***R-3***

## 'Hêzên navneteweyî li ser xwîna gelan bazarê dikin'



Emîna Bîrem diyar kir ku ji bo têkbirina dagîrkeriyê amade ne û got, Hêzên navneteweyî li ser xwîna gelan bazarê dikin. Dewleta tirkî jî li ser tevayiya herêmê xeter e û yekîtiya gelan tenê dikare vê xeterê ji holê rake. ***R-4***

## `Divê em herêmên dagîrkirî rizgar bikin û planên Tirkiyê pûç bikin`

Walatiyên Til Temir li dijî plan û êrişên dewleta tirkî gotin, divê em gelê herêmê bi hev re bajarên dagîrkirî rizgar bikin, planên dewleta dagîrker pûç bikin û rê nedin dagîrkeriya wê. ***R-5***

## 'Divê sîxûr bi cezayê herî giran bên darizandin'



Lixwemikurhatina sîxûrê bi navê Yûsif û hevjînên wî ku bûne sedema şehîdxistina şervan û fermandarên QSD'ê, di bernameyeke teybet ya Ronahî TV de hat weşandin. Malbatên sîxuran li dijî wan helwesta xwe diyar kirin û gotin, dijminayiya gelê xwe kirine û divê bi cezayê herî giran bên darizandin. ***R-3***

## Li Dêrezorê nexweşxaneya Giştî ya El Kesra tê çeksazkirin

Komîteya Tenduristiyê ya herêma Dêrezorê Nexweşxaneya Giştî ya El Kesra ya ku ji aliyê çeteyên DAIŞ`ê ve hatibû rûxandin çeksaz dike û hewl dide rewşa tenduristiyê li herêmê bi pêş bixe. ***R-6***

# Weqfa Jina Azad perwerdeya destwerdana lezgîn ji jinan re didomîne

Bi armanca pêşxistina jinan di milê tenduristiyê de û amadekiriya ji bo rewşa awarte, Weqfa Jina Azad bi navê `Tenduristî di şer de` ji bo fêrkirina destwedana lezgîn ji jinan re perwerde daye destpêkirin.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Kampanya destwerdana lezgîn ji 23`yê meha borî ve dest pê kiriye û heta niha jî berdewam e. Herwiha Weqif kursên destwerdana lezgîn dide jinan, da ku di rewşên awarte de parastina xwe, zarok û dê û bavên xwe bikin. Her perwerdeyê bi her du beşên xwe yên teorî û pratîk çar rojan dewam dike. Ev perwerde di çarçoveya rewşa awarte de pêk tê. Heta niha jî gelek jinên bajarê Qamişlo di perwerdeyê de derbas bûne.



ser armanca kampaniyayê û girîngiya kursên destwerdana lezgîn rêvebera Weqfa Jina Azad ya beşa tenduristiyê Melka Hesaf ji me re axivî û got, piştî ragihandina rewşa awarte li herêmê û zêdebûna êrişên dewleta Tirkî ya dagîrker li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, me biryar da ku dewreyên destwerdana lezgîn bidin jinan, da ku jin di şert û mercan şer yên awarte de bikarin ji civaka xwe re bibin alîkar.

**Di dema pêş de emê li tevayiya gundan perwerdeyê bidin`**

Melka Hesaf da zanîn ku dewreya destwerdana lezgîn li gelek taxan dane û axaftina xwe wiha domand: "Cihê ku perwerde lê hatiye dayîn, kongreya Star ya taxa Xerbî, taxa Cûdî, navenda PYD ya Aşûriyê, komîna şehîd Berxwedan, Mala Jinan û Rêxistina Sara. Di van dewreyan de gelek jin tevlî bûn û fêrî destwerdana lezgîn bûn.





Herwiha got, gundewarê Qamişlo jî di plana me de ye. Di dema pêş de emê perwerdeyê li tevayiya gundan jî bidin."

Melka got, armanca me ji vê dewreyê ew e ku jin di milê tenduristiyê de zana bibin û di rewşên awarte de xwe û yên derdora xwe biparêzin. Heriwha nekevin tengayiyê û tirs di dilê wan de nemîne. Çimkî em di rewşeke awarte de ne û ne diyar e ka kîjan gavê dijmin êrişî me bike.

**`Tevayiya jinên ku tevlî perwerdeyê dibin sûdê jê digirin`**

Melka Hesaf da xuyakirin ku her dewre çar rojan dewam dike, her rojê sê saetan dirêj dike û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Kursên ku di perwerdeyê de tên dayîn li ser rewşên şewatê, şkandinê, birîn, herwiha fêrkirina li ser seromê û dayîna derziyan e. Ev perwerde encamên pir baş dide. Tevayiya jinên ku tevlî dibin sûdê jê digirin û hêza wan di milê tenduristiyê de xurt dibe."

Rêvebera Weqfa Jina Azad ya beşa Tenduristiyê Meleke Hesaf di dawiya axaftina xwe de got, em bi hêvî ne ku jin di vê qonaxê de cihê xwe bigire û di her qadê de xwe pêş bixe. Wek Weqfa Jina Azad jî emê her dem piştgiriyê bidin jinê û ji bo pêşxistina jinan tev bigerin.

# Egîd kî ne?

Dema gotina Egîd derbas dibe hestên bawerî, wêrekî û qehremaniyê di hundirê mirov de gurr û geş dibin. Ewê egîd be; cihê baweriyê ye, pişta mirov pê rast e, edaletê diparêze, xwediyê axaftina xwe ye, kesek wêrek, camêr û merd e. Me wisa nas kiriye û zaniye. Di vir de heqîqeteke dîrokî ya bi dehhezaran salan hatiye honan û xwe tîne ziman. Ev bandora hafizaya civakî bixwe ye.

Weke civak û jinên Kurd em vê heqîqetê baş dizanin û hîs dikin. Bi hezaran rûpelan nehatibe nîvîsandin û weke pirtûk pir zêde belav nebûyîbin jî her nebe, me ji çîrokên dapîr û bapîrên xwe bîhîstine. Me di destan, kilam û lorandinên pêşiyên xwe de guhdar kirine. Dema hîn di temenên xwe yên zarokatiyê de me ev guhdar kirine, heta dibe ku gelekan ji me, xwe xistibin şûna wan qehremanan û xeyalên wan li ber çavên xwe zîndî kiribin jî.

Di vê çanda civaka xwezayî de mêr xwedî taybetmendiyên ciwamêr, wêrek, merd û egît bûye. Ev weke nasnameya mêr pêşketiye. Nirxên civakê parastine, dema pêwîst kir ji bo wê şer kirine, li dijî her cure zilm neheqiyê derketine û di her keliya jiyanê de bi jinê re hevaltiyek rast kirine. Ger wiha bûne ji aliyê jin û civakê ve hatine pejirandin. Jiyan bi xwezayê re di nava lihevkirinê de herîkiye. Pirsgirêk û qrîzên ji aliyê mirovan ve hatine çêkirin serwer nebûne. Li ser vê bingehê jin û zilam bi hev re civakbûn ber bi pêştir birine. Bi qasî lêkolînên dîrokî, ev rastiya hîn di roja me ya îro de jî berdewam dike, vê heqîqetê diselmîne.

Egîtbûn nasnameyeke ji aliyê civakê ve tê dayîn. Li gorî taybetmendî û karên wî/wê kesî civak wî wesifî lê dike. Ango egîtbûn pêştir nayê bidestxistin, lê tê avakirin. Herdem dagirker û dewletî jî vê nasnamê li hemberî xwe weke xeterî dibînîn. Mirovên egît li hemberî zilmê serî natewînîn, nirxên civaka xwe diparêzin, lewma hêz û saziyên zordar di hebûna egîdan de nebûna xwe dibînîn. Ji ber vê herdem rûbirûyî dijbertiya zaliman tên. Lewma egîtbûn ne tiştekî hesan e. Her kesek jî bi hesanî nikare egît be.

Van rojan em di 38' emîn salvegera 15'ê Tebax'ê de ne. Weke Artêşa Rizgariya Gelê Kurd yekemîn fîşeka li dijî dewleta faşîst a Komara Tirkiyê hat teqandin. Ev roj ji aliyê gelê Kurd ve weke cejna wejînê hate pejirandin. Bi perspektîfên Rêber APO û fermandariya Heval Egît ev hat serxistin. Dema behsa 15'ê Tebaxê tê kirin, beriya her tiştî kesayeta Heval Egît (Mahsum Korkmaz) tê bîra mirov. 15'ê Tebax û Heval Egît bûne yek û heman tişt. Mirov nikare van ji hev cuda bifikire. Tirs û tarîtiya li ser gelê Kurd hatibû avakirin, hate şikandin. Wêrekiya şer û têkoşînê di mirovên Kurd de hate geş kirin. Careke din hêvî û bawerî hat şîn kirin. Tirs û şermbûna ji xwe hate perçe kirin. Vegera nirxên civakbûn û gelbûna xwe pêşket û ev hatin parastin. Heval Egît fermandariya vê kir, wêrekiya kesekî raber nedikir, raxist ber çavên dost û dijminan. Bi mirovan re hevaltiyek rast kir. Ji xweber navê Heval Mahsum Korkmaz ne Egît bû. Heval Egît nasnameya egîtbûnê di kesayeta xwe de şênber kir. Heqîqeta dîrokî di kesayeta xwe de zîndî kir.

Ji fîşeka yekemîn heta fîşeka herî dawî ku niha li hember dijmin tê teqandin, dibin fermandariya Heval Egît û nasnameya civakî ya egîdiyê de ev tekoşîn berdewam dike. Zîndî û geşe. Heqîqeta civaka Kurd, bi paradîgmaya civaka demokratîk, ekolojîk û azadiya jinê ya Rêber APO pêşxistiye hîn xurttir xwe jîndar dike. Egîdî di vê felsefê de dighêje wateya xwe ya rasteqîn. 38 sale şerê azadiyê tê kirin. Qet ne hesan e. Dibe hevokek kurt be, lê naveroka wê ya kêlî bi kêlî dikare bibe mijara bi deh hezaran pirtûk û fîlman. 38 salin li ser şopa Heval Egît gerîllayên azadiya Kurdistanê şer û têkoşîn dikin. Di çend salên dawî de ji Bakur heta Heftenîn, ji Garê heta Werxelê û Xakurkê şer dijwartir bû. Bi taybet jî ev nêzîkî 4 mehe Şerê Hebûn û Nebûnê li Zap û Metinayê tê kirin. Li dijî teknîka herî pêşketî û çekên kîmyewî yê dewlet û hukumeta wê AKP û MHP ya faşîst û dagirker ev şer tê meşandin. Di êrîşên dijmin de xiyaneta PDK'ê jî bitemamî eşkere ye.

Tevî hemû zehmetiyan jî gerîlla ne di rewşa parastinê de ye. Gerîlla bi xwe êrîşî zalim û dagirkeran dike. Dijmin tenê bawerî bi teknîk û kîmyasalên xwe tîne. Raste balafirên bê mirov 24 seet digerin û ew xwedî teknîkeke şopandinê yê pêşketinê ne. Lê gerîlla tevî şopandinê jî kariye xwe ji wan wenda bike û di dem û cîhên ne li bendê bi çalekiyên mezin derkeve pêşberî wan.


Îro gerîlla destanan dinîvîsînin. Her roj destanên nûjen ên parastina gel û azadiya welat bi jiyanê dinivîsînin. Di heman demê de xwedî li keramet û rûmeta mirovahiyê jî derdikevin. Ev ne egîdi be ma çiye? Me çanda egîdiyê ji dîroka xwe ya civakî wergirt û bi Heval Egît re dest bi vî şerê rûmetê kir. Îro jî dibin fermandariya Heval Egît de bi Egîdên demê re em berdewam dikin. Raste egîdî ne hesane, lê her gerîllayek li çiyayên Kurdistanê jî Egîdeke.

*Çavkanî: Pajk.org*-**Dêrsim Aras**



# Xeyaleke min heye

Her ku ez li van belgefilman temaşe dikim û van rêzefilman dibînim, dilê xwe dibijînim wan û di ber xwe de dibêjim, "Çima belgefilmeke me ya birêkûpêk li ser 15'ê Tebaxê nîne!" û aciz dibim. Dema Egîd û hevalên wî tên bîra min hêrsa min pirtir dibe.



Dema em berê xwe didin hin bûyer û qewimînên şoreşgerî yên dinyayê, em dibînin ku derbarê wan bûyeran de gelek belgefilm û rêzefilm hatine çêkirin. Çi baş çi xerab, lê bi awayekî hin tişt li ser van bûyeran hatine sêwirandin û xelk li wan temaşe dikin. Nexasim derbarê Che Guevara de di vî warî de gelek ceribandin hene. Çend belgefilmên baş hene ku behsa rêwîtiya wî dikin. Her ku ez li van belgefilm û rêzefilman temaşe dikim, dilê xwe dibijînim wan û di ber xwe re dibêjim, "Çima belgefilmeke me ya bi rêk û pêk li ser 15'ê Tebaxê tine ye!" û aciz dibim. Dema Egîd û hevrêyên wî tên bîra minm, hêrsa min bêhtir radibe. Dûre jî xeyala belgefilmekê dikim, belgefilmeke ku li Dihê û Şemzînanê bi awayekî paralel bi hev ve hatiye girêdan û behsa çalakiyên pêngava 15'ê Tebaxê dike; ya ku pêngava vejîneke pîroz vedibêje û ruhekî mirî ji nû ve bi rih dike li çiyayên Kurdistanê.

Meriv carna dixwaze bi arşîv û hin çavkaniyan dakeve û li hin tiştan temaşe bike. Ji wan hin tiştan hîn bibe û careke din li ser birame. Ez li vir behsa xwendinê nakim ha! Yekser behsa "temaşekirin" ê dikim. Yanî arşîva dîtbarî, dîmenên reş û spî, yan jî dîmenên ku bi kamerayên kevn hatine girtin û xera ne. Hin wêneyên reş û spî ku li ser wan leke hene û her tiştên kevn yên bi vî rengî.

**15'ê Tebaxê bi belgefilmekê**

Lê her ku ez derbarê 15'ê Tebaxê de rastî hin dîmen û fotografan têm dilê min diêşe. Tenê ji xeynî çend wêneyên dema çalakiyê û helbet wêneyê bi heybet ê Egîd, mixabin ti tiştî bi dest naxim. Helbet bibîranînên hevrêyên Egîd yên wan rojan jî hêja ne û ew jî rêyekê ber meriv dixin da ku meriv zêdetir texeyula wan rojên dijwar bike. Li wî weneyî dinihêrim û li wan kêliyan dihizirim. Wan kêliyên dîrokî tînim ber çavên xwe, weke rêzefilmekê, yên ku rêwîtiyeke bêhempa dan destpêkirin li çiyayên Kurdistanê. Gabar, ti çi navekî xweş û bi heybet î! Egîd û hevalên xwe hûn çi kesên bi rûmet in. Gelo wan di wan kêliyan dîrokî de çi hîs kir, tirs û wêrekiya wan, kêmasî û derfetên wan, nihêrîn û meşa wan a ber bi azadiyê ve pirr meraq dikim. Helbet ne pêkan e meriv dîmenên rastî yên wê demê bi dest bixe, lê çima meriv nikaribe ji nû ve wan kêliyan zindî bike û bi rêya belgefilmekê bide fêhmkirin? Sponsorekî weke tevgera Azadî li pey meriv be, ev yek pêkan e ez dibêjim! Ji lewre, li dinyayê kêm sponsorên wiha bi hêz hene. Meriv dikare wan kêliyan ji nûve zindî bike û belgefilmeke bi tesîr çêke. Ez li vir behsa filmên "fiction" nakim, behsa belgfilmekê dikim. Lewma, li gorî min belgefilm tişta herî nêzî jiyana rastîn e. Ew bi hêz û bandor e û xwedî şêwazeke resen e. Bi riya çend gerîlayan ji nû ve zindîkirina pêngava 15'ê Tebaxê, ha ez vê yekê xeyal dikim. Ev yek ewqas zehmet nîne û bi ekîbeke serketî dikare pêk were. Heger gerîla bi xwe vê belgefilmê çêke ev manedartir e. Li gorî tecrûbeya wan ya di vî warî de bi ya min, ew dikarin çêkin jî. Ew hêz, taqet û nihêrîna wan ya sînemayî jî heye.

**Metaforên 'guleya yekem' û 'çiya'**

Lewma, her 15'ê Tebaxê li belgefilmekê dihizirim. Di xeyal û asoyên xwe de li rêwîtiya şoreşgerên "guleya yekem" bera pêsîra dijmin dan, difikirim. Çi rêwîtiyeke bedew bû, çi dengekî bi tîn bû. Çima ji olana van guleyan muzîkeke filmekê çênebe, çima ji wan şivereyên meqab maç kirine dîmenên berxwedanê neyên fesilandin? Ji awirên Egîd ên ku dema haziriya çalakiyan dike bi hevrêyên xwe re, çima yek ji plan-sekansên herî baş ên dinyayê neyê amadekirin? Tenê meteforên "guleya yekem" û "çiya" dikarin gelek tiştan bi meriv bidin fikirandin. Li ser gotinên mêhtingeran û karîkatûrên rojnameyên dewleta Tirk ên ku wê demê digotin, "Kurdistana xeyalî li vir veşartî ye" meriv dikare gelek tiştan bisêwirîne û rizgarkirina çiyayên Kurdistanê bîne ziman. Ew Kurdistana ku hatibû binaxkirin û bi ser de jî beton hatibû rêtin!

**Prologa belgefilma min**

Heta dema li vê belgefilmê dihizirim sehneya yekem a weke prologekê jî wiha ye; "Li serê çiyayekî bilind mezeleke ji betonê ku li ser 'Kurdistana xeyalî li vir veşartî ye' dinivîse heye. Çend gerîla li dora çiya hin teqemeniyan hazir dikin. Paşê ji dûr ve wê mezelê diteqînin!" Piştî vê sehneyê belgefilm dest pê dike. Tenê ev sehne bi serê xwe dikare gelek tiştan ji xelkê re vebêje. Bi ya min metaforeke giring e. Eynî weke ya gerîlayan li çiyayên Kurdistanê mezelek li ser "Mêhtingeriya xeyalî li vir veşartî ye" nivîsandî çêkiribûn.

Heya belgefilmeke bi vî rengî çênebe, ez ê her 15'ê Tebaxê xeyala xwe dubare bikim û tiştekî din lê zêde bikim. Bi hêviya rojekê ev xeyala min pêk were û ez li vê belgefilmê temaşe bikim. Em li sînemaya gerîla bifikirin. Heger em filma "Bêrîtan" bînin ber çavên xwe ti ferqa vî filmî ji "guleya yekem" ya ku Egîd reşand ser mêhtîngeran tine ye! Di warê tesîrê de heman tişt in.

***Ozgûr Polîtîka***

# 'Ziman mifteya azadiyê ye'

**Li ser mijara "Di qirkirina çand û ziman de rola qeyûman" li avayiya Rêxistina Partiya Demokratîk ya Gelan(HDP) şaxê Cîzîrê panelek hat lidarxistin.**

Li ser mijara "Di qirkirina çand û ziman de rola qeyûman" li avahiya Rêxistina Partiya Demokratîk a Gelan(HDP) a Cîzîrê panelek hate lidarxistin. Moderatoriya panelê Hevşaredara Stewrê Gulistan Oncu kir. Parlamenterê HDP'ê yê Rihayê Omer Ocalan, Hevserokê Komeleya Lêkolînê ya Ziman û Çandên Mezopotamyayê (MED-DER) Rifat Ronî û Civaknas Helîm Barîn weke axivîner beşdarî panelê bûn.

Di heman demê de Parlementera HDP'ê ya Şirnexê Nûran Îmîr, rêxistinên navend û navçeyên HDP'ê yên Şirnexê, Tevgera Jinên Azad(TJA), Meclîsa Dayikên Aştiyê jî tev li panelê bûn. Di eywanê de pankarta "Di qirkirina çand û ziman de rola qeyûman" hate daliqandin. Panel piştî rêzgirtinê, bi pêşkeşkirina sînevîzyona derheqa girîngiya çand û ziman û qirkirina qeyûman a li ser çandê dest pê kir.

**Polîtîkayên qeyûman ne nû ne!**

Di destpêkê de parlementer Omer Ocalan axivî. Ocalan, anî ziman ku polîtîkayên qeyûm yên sed salan in û wiha axivî: "Polîtîkayên peyûman ne nû ne, berê jî hebûn û ew format diguherin. Sed sal berê jî di dema avakirina Komara Tirkiyeyê de ew polîtîkayên xwe bi înkarkirina pirsgirêka Kurd, polîtîkayên bişaftinê, bi plana şarkislahatê pêş xistin. Ango bi sed salane qirkirinek çandî tê meşandin. Em di tax û malên xwe de bi Kurdî diaxivin. Her wiha şaredariyên me jî li ziman xwedî derketin û di saziyan de bikaranîn. Ji lewre hikûmet tehamûlê vê yekê nekir û qeyûm avêt ser şaredariyan."

**'Mifte di destê gelê Kurd de ye'**

Piştre Hevserokê MED-DER'ê Rifat Ronî axivî. Ronî jî bal kişand ser girîngiya rêveberiyên xwecihî û wiha avivî:

"Qeyûm di her alî de dest danîne




ser mafên civakê. Ew karmendê dewletê ne û îradeye gel binpê kirine. Çand û ziman ji aliyê rêveberiyên herêmî ve xwedî roleke girîng e. Ji ber ku ziman û çand bi vê yekê pêş ve diçe. Lewra desthilatdar pêşketina ziman û çanda gelê Kurd li dijî xwe dibîne. Qeyûm destpêkê tabelayên Kurdî rakirin, sazîyên çandî hatin girtin û sazî û dezgehên jinan hatin girtin. Lê belê gelê Kurd rexmî van hemû zext û binpêkirin û qedexeyan, li ber xwe da û têkoşîna xwe berdewam kir. Ziman mifteya azadiya gelê kurd e û ew jî di destê gelê Kurd de ye."

**'Dayikeke aştiyê ji civaknasekî çêtir e'**

Civaknas Helîm Barîn ê herî dawî axivî jî destnîşan kir ku her civak bi rêya çandê xwe pênase dike û got: "Ji bo gelê Kurd dayikeke aştiyê ji civaknasekî çêtir e. Her civak bi riya çandê xwe bi rê ve dibe. Çand nasnameya civakê ye. Dema ku mirovek ji çanda xwe dûr dikeve ew dimire. Pergala mêtîngerî vê dike. Çand bê parastin nabe. Di bingeha esasî de parastina çandê divê. Ji bo di metingeriyê de gava berjewendiyên pergalên yekperest yek bin, li dijî vê yekitiya xwe ava dikin. Lê divê em jî li dijî vê derbikevin û ji bo parastina çand û zimanî yekitiya xwe ava bikin. Gava em dibêjin çand tenê govend, stran û rengên me tên bîra me. Lê belê aborî, siyaset û gelek qadên civakî jî çand in." Piştî axaftinan panel bi pirs û bersivan bi dawî bû.

***MA/ŞIRNEX***

# Li Dêrezorê nexweşxaneya Giştî ya El Kesra tê çeksazkirin

Komîteya Tenduristiyê ya herêma Dêrezorê Nexweşxaneya Giştî ya El Kesra ya ku ji aliyê çeteyên DAIŞ`ê ve hatibû rûxandin çeksaz dike û hewl dide rewşa tenduristiyê li herêmê bi pêş bixe.

**Darîn Silê/Dêrezor**

Dema ku çeteyên DAIŞ`ê darbasî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê bûn gelek xirabî û hovîtî li herêmê pêk anîn. Li Dêrezorê jî ji ber êrişên çeteyan, gelek navend û nexweşxaneyên bajêr hatibûn roxandin. Yek ji wan nexweşxaneya Giştê ya El Kesra ye, ku xirabiyên pir mezin têde hatibûn kirin û amûrên wê hatibûn windakirin bû. Ji bilî wê jî, gelek nexweşxaneyên bajêr hatibûn roxandin. Piştî rizgarkirina bajar û derxistina çeteyan ji herêmê, welatiyên Dêrezorê pir zehmetî ji aliyê tenduristiyê ve dîtin. Herwiha gelê herêmê daxwaza nûkirina Nexweşxaneya Giştî ya El Kesra kirin. Ji bo wê jî komîteya Tenduristiyê li ser daxwaza gel, nexweşxaneyê ji nû ve çeksaz dike. Da ku di dema pêş de bikeve xizmeta gel.

Têkildarî sererastkirina Nexweşxaneya Giştî ya El Kesra, Hevserokê Komîteya Tenduristiyê yê herêma Dêrezorê Mihemed Salim, ji rojnameya me re axivî û da zanîn ku armanca wan ya sereke pêşxistina rewşa tenduristiyê û xizmeta gelê herêmê ye.

**Bandora şer li ser rewşa tenduristiyê**

Mihemed Salim destnîşan kir ku şêrê 10 salan yê li ser Herêmê, bandoreke pir mezin di aliyê derfetên tenduriştiyê kir û got, Dêrezor herêmeke berfirehe ku ji Cezrat heta Baxozê nêzî 300 Km dirêj dike. Ev şer bû sedema wêrankirina gelek navend, nexweşxane û kilînîkan. Ji bo wê jî wek Komîteya Tenduristiyê me biryar da ku tevayiya nexweşxaneyê di şer de hatibû hedefgirtin ji nû ve çeksaz bikin. Yek ji nexeşxaneyên ku niha tê çeksazkirin nexweşxaneya Giştî ya El Kesra ye.





Mihemed Salim wiha domand: "Me 462 hezar dolar ji bo sererastkirina Nexweşxaneya Giştî ya El Kesra hilbijartiye, lê li gorî rûbera nexweşxaneyê kêm e. Çimkî nexweşxane pir mezin e û rûberê her qatê hezar û 875 m4 ye, ji bo wê jî emê qatê yekê tenê çeksaz bikin. herwiha got, demê ku ji bo çeksazkirinê hatiye hilbijartin 180 roje, ji bo wê jî dê sererastkirin di dawiya vê salê de temam bibe.

**`Armanc ew e ku nexweşxaneyeke navendî li bajarê Kesra çêbibe`**

Mihemed Salim diyar kir ku armanca wan ji çeksazkirina vê nexweşxaneyê ew e ku nexweşxaneyeke navendî li bajarê El-Kesra hebe û xizmeta gelê wê pêk bîne û wiha dom kir: "Ji bajarê El-Kerame yê rojhilatê Reqayê heta bajarê El Meamil , bi dirêjahiya 140-150 km, navendên xizmetê yên Tenduristiyê nînin. Ji bo wê pêwîstî bi çeksazkirina vê nexweşxaneyê hebû. Herwiha got, piştî çeksazkirinê dê nexweşxane bikeve xizmetê gel û wê pirsgirêka nexweşên deverê heya astekm bê çareserkirin."

**`Li nexweşxaneyê tedawîkirin bê pere ye`**

Mihemed Salim got, Nexweşxaneya El-Kesra nexweşxaneyeke navendî ye ku tevayiya beşên tenduristiyê tê de hene. Beşê hundirîn, yê jin, zarok, şûştina gurçikan, tedawîkirina fîzîkî, derûnî, emeliyat û beşê tedawîkirina lezgîn li nexweşxaneyê hene. Herwiha Mihemed bîr xist ku li nexweşxaneya El Kesra tedawîkirin bê pere ye.

Hevserokê Komîteya Tenduristiyê ya herêma Dêrezorê Mihemed Salim di dawiya axaftina xwe de got, wek komîteya Tenduristiyê ya Dêrezor plana me ew e ku her 40 km nexweşxaneyek hebe. Da ku xizmeta gelê herêmê bi giştî bê kirin û gel neçarî nexweşxaneyên dûr nebe.

# Mirin çiye?

**Em Kurd di vê pêvajoyê de pir gotina ku 'em di pêvajoya hebûn û tinebûnê de ne' bi kar tînin, lê em çeqas di rastiya vê gotinê de jiyan dikin, mijara lêpirsînê ye.**

**Sara Kerem**

Pirsa ku Mirin Çiye? dibe ji bo pir kesan, pirseke di rêzê de be û bersiv jî ev be; 'Dema rih ji laş derdikeve ev kes dimire'. Lê belê eger em bêjin ka bifikirin, di jiyana we de ti kesê we nîne; an jî cîran, nas, dost, xweşvî, heval û malbat ; mirovên bê ku bi berjewendiya xwe bifikirin û deriyê xwe li we vekin, heta kesên berjewendîperest jî, we winda kirîne; kesekî ku we di jiyana xwe de qebûl bike û qedir û qîmet bide we nîne. Ango hûn li ser dinê bê qîmet, nirx û rûmet mayine. Gelo hûnê bikaribin bêjin, 'em jiyan dikin', an jî 'em disa jî dikarin jiyan bikin'!


Em Kurd di vê pêvajoyê de pir gotina ku 'em di pêvajoya hebûn û tinebûnê de ne' bi kar tînin, lê em çeqas di rastiya vê gotinê de jiyan dikin, mijara lêpirsînê ye.

Hebûn(jiyan) rûmet e, nirx e, qedir û qîmet e. Eger xaka te, netewa te, şeref û namusa te, ziman, çand û diroka te nînbe, wê demê tu jî tineye. Eger tu wek koleyekî, ango amûrekî bê nav, bêhesibandin û tû jî li dijî vê yekê tekoşinekê neke, wê demê tu nikarî bêjî ez jiyan dikim, tu tûneyî ango miriyî.

Ji bo wê Kurdê tekoşer û bi rûmet dibêje em şerê hebûn û tinebûnê dikin. Lewra dizane ku eger şer neke wê her tiştê xwe winda bike, dema ku her tiştê xwe jî winda kir, ti wateya ku rih di laş de heye namîne. Ango Kurd ne miriye, ji ber ku şerê hebûnê dike, gelekî mirî nikare şer û tekoşînê bike.

Lê belê, cihê mixabiniyê ye ku Kurdê 'jiyana mirî' hilbijartiye jî heye û ev Kurde yê ku mala Kurdê bi şeref û rûmet xirab dike; li pêşiya hebûnê dibe kelem, dibe rûreşiya mirovayiyê. Eger em minakekê ji wan Kurdên ku di demekê nêzde herkes bûye şahidê jiyana wa ya mirî bidin, dibe ku wateya mirinê ya rast di hişê me de hê zelaltir bibe.

Di 31'ê Tîrmehê de QSD'ê, ragihandibû ku di çarçoveya "Operasyona Sondê" de sîxur û xayînên ku bi MÎT'ê re dixebitin û di şehîdxistina gelek şervan û hemwelatiyan de rol lîstine hatine girtin. Lixwemikûrhatina hinek ji van sîxuran, tevayî belge û daneyên sîxurtiyê yên ketine destê hêzên ewlekariy de di bernameya bi navê 'Rûyên Veşartî' ya Ronahî T V de,



hate weşandin. Di xeleka yekê ya vê bernameyê de lixwemikûrhatina sîxurê bi navê Yûsif Osman Sîdo ku ji gundê Erîşa ya Serêkaniyê ye û hevjînên wî hat weşandin.

Ew li ser xaka ku bi xwîna xweşk û birayên wan hatiye rizgarkirin, bûne sedema şehîdxistina şervan û fermandarên QSD'ê ku rêhevalên xweşk û birayên wan bûn.

Mixabin ev sîxure kurdin û malbatên wan walatparêz û xwedê şehîdên tekoşîna azadiyê ne...

Malbatên wan bi rêya çapemeniyê dengê xwe gihand gel û cîhanê ku ew wan zarokên xwe red dikin û di jiyana xwe de qebûl nakin. Herwiha dibêjin, divê ew bi cezayê herî giran bên darizandin.

Dayîka sîxurê bi navê Yûsif dibêje: "Ez dayîka Yûsif'im lê ew ne lewê min e, ew xayîn e, emîl e, dijmin e. Çi jê dikin bila bikin, ez heqê xwe ne li vê dinê, ne li wê dinê lê helal nakim. Ew birayê du şehidan bû... karê kirî ne karê mirovan e... " Ez bawerim kê ev dayîke guhdar kiribe laşê wî cemidiye. Ji ber ku dayikek zûbizû ji bo zarokê xwe, parçeyê ji bedena xwe, wiha nabîje. Eger ji bo dayîkekê êdî jiyana zarokê wê bê wate bibe, êdî ew zarok bixwe miriye.

Mirina ku rih ji can derdikeve, di heqîqeta xwe de dewamiya jiyanê ye, ango mirov tine nabe, derbasî qonaxeke din ya jiyanê dibe. Lê dema mirov wek xayinên xak û gelê xwe bê şeref, namus, rûmet, qedir û nirx dibe, mirov rastî jî dimire. Ji ber ku ew kes ji hemû tiştên ku jiyanê pênase dike, bê par dimîne û tine dibe.

Tiştê ku kesan dibe xiyanetê ne malê dinêye, ma mirov qet dikare hebûna xwe bifiroşe. Tiştê ku kesan dibe xîyanetê, rihê miriye.



# Ferhad Şamî: Wê ti êrişên dewleta dagîrker bêbersiv nemînin

Ferhad Şamî diyar kir ku sekinandina dewriyeyên hevbeş yên Rûsî û dewleta tirkî planên wan yên hevbeş eşkere dike. Herwiha da zanîn ku ev hefteyek e tevgera dewleta tirkî ya faşîst zêde dibe û got, ev tê wateya ku amadekariya êrişekê nû dike û lê ti êriş wê bêbersiv nemînin.

**Navenda Nûçeyan/ Qamişlo**

Êrişên dewleta Tirk a dagirker li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi rêya topbaranê û balafirên keşfê yên biçek di demên dawîn de zêdetir bûne. Artêşa Tirk a dagirker bajar û gundewarên bajarê Kobanê, gundên navçeyên Dirbesiyê, Til Temir û Zirgan yên kantona Hesekê, navçeya Amûdê ya kantona Qamişlo û gundên navçeya Şêrewa ya kantona Efrînê ya dagirkirî bê navber topbaran dike. Di topbaranê de hemwalatî şehid û birîndar bûn.



Berpirsê Navenda Ragihandinê ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Ferhad Şamî, derbarê van êrişên bê ser û ber û îdiayên dewleta Tirk a dagirker ku dibêje QSD`ê êriş biriye ser me, ji ajansa ANHA re axivî.

Ferhad Şamî destnîşan kir ku ev hefteyeke dewleta Tirk a dagirker xwe ji bo êrişeke nû li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê amade dike.

Herwiha Şamî da zanîn ku hebûna leşkerên hikumeta Şamê li cihên tên topbarankirin li pêşiya êrişên dewleta Tirk nebû astengî. Ferhad Şamî da xuyakirin ku planên Rûsî û dewleta faşîst ya Tirkiyê bi sekinandina dewreyên wan yên hevbeş eşkere bû û da diyarkirin ku di tevgera wan de diyar bû ku li hember hebûna hukumeta Şamê ti hesabên wa nînin û bi êrişên xwe re dixwazin Sûrî bixin nava aloziyekê pir mezin.

Berpirsê navenda ragihandina QSD'ê Ferhat Şamî banga gel kir û got, dewleta dagirker dixwaze herêmê vala bike. bila ti kes terka cih û warê xwe neke. Herwiha bila gelê me bizanibe ku ti êrişên dewleta tirkî bê bersiv namînin û emê bi gelê xwe re tola van êrişên hov rakin û di gotinên xwe de teqez kir ku yê winda bike wê dijminê kurda be.

# 'Divê sîxûr bi cezayê herî giran bên darizandin'

**Navenda Nûçeyan-Ronahî**

**Lixwemikurhatina sîxûrê bi navê Yûsif û hevjînên wî ku bûne sedema şehîdxistina şervan û fermandarên QSD'ê, di bernameyeke teybet ya Ronahî TV de hat weşandin. Malbatên sîxuran li dijî wan helwesta xwe diyar kirin û gotin, dijminayiya gelê xwe kirine û divê bi cezayê herî giran bên darizandin.**

Di 31'ê Tîrmehê de QSD'ê, ragihandibû ku di çarçoveya "Operasyona Sondê" de sîxûrên ku bi MÎT'ê re dixebitin û di şehîdxistina gelek şervan û hemwelatiyan de rol lîstine hatine girtin.

Lixwemikûrhatina hinek ji van sîxuran, tevayî belge û daneyên sîxûrtiyê yên bi dest hêzên ewlekariyê ketine di bernameya bi navê 'Rûyên Veşartî' ya Ronahî TV de, hate weşandin. Di bernameyê de bi taybetî lixwemikûrhatina sîxûrê bi navê Yûsif Osman Sîdo ku ji gundê Erîşa ya Serêkaniyê ye û hevjînên wî, hate weşandin. Ev Sîxure li xwemikûrhatin ku li Til Temirê bûne sedema şehîdxistina şervan û fermandarên QSD'ê.



Bi rêya "Operesyona Sondê" cîhan hemû pê hesiya ku MÎT'a dewleta tirkî ya dagîrker ka bi şerê xwe yê qirêj çawa kesan di nava gelê wî de bê rûmed û nirx dike. Herwiha malbatên sîxûran û yên şehîdan jî ji bo Ronahî TV axivîn û helwesta xwe ya li dijî şerê qirêj yê dewleta tirkî û kesên ku bi dijminê xwe dixapin û li dijî walat û tekoşina xwe dibin sîxur diyar kir.

Malbatên Sîxura ku xwedî şehîdane dan diyar kirin ku, xayîntiya li walat û tekoşina azadiyê dijminahî ya herî mezin e û teqez kirin ku ew van kesan ne wek ewlad, wek dijmin dibînin. Herwiha dan zanin ku divê ew sîxur bi cazayê herî giran bên darizandin.

# YPS-JIN: Divê gelê Kurdistanê berxwedana ji bo rêveberiya xweser bihêz bike

**Tîmên YPS-JIN, bi pêmana Pêngava 15'ê Tebaxê li dijî rejima faşîst ya AKP-MHP'ê çalakî kirin û peyama bihêzkirina berxwedana ji bo rêveberiya xweser dan.**

Tîmên Tolhildanê yên Şehîd Çekwar Çûkûr û Şehîd Roza Botanê yên YPS-JIN, bi pêmana Pêngava 15'ê Tebaxê çalakî kirin.

Derbarê çalkiyê de Tîma Tolhildanê ya Şehîd Çekdar Çûkûr û Şehîd Roza Botanê yên YPS-JIN'ê daxuyanî dan.

Tîma Tolhildanê ya Şehîd Çekdar Çûkûr ya YPS-JIN'ê diyar kirin ku bi armanca pîrozkirina 15'ê Tebaxê Cejna Vejînê wan çalakiyek li dar xistin û wiha gotin: "Serdema têkoşîna çekdarî ya 15'ê Tebaxê ya di çarçoveya têkoşîna azadiyê ya Rêber Apo de dest pê bû, bi kelecana xwe ya roja ewilîn didome. Tîma Tolhildanê yên Bersivê ya Şehîd Çekwar Çûkûr ya YPS-JIN'ê, bi armanca pîrozkirina 15'ê Tebaxê Cejna Vejînê, şeva 12'ê Tebaxê li navçeya Bismil ya Amedê saet di 01.30'î de bi fişekên hewayî li şaxekî marketên BÎM'ê xist."

Tîma Tolhildanê ya Şehîd Çekdar Çûkûr ya YPS-JIN'ê daxuyakirin ku divê gelê Kurdistanê li dijî sazî û dezgehên rejîma faşîst çalakiyan li dar bixin û wiha got: "YPS'e wê BÎM û saziyên din yên rejîma faşîst ya AKP-MHP'ê bixe. Rejîma faşîst, bi kara ku ji saziyên wek BÎM'ê dike çekan distîne û pê li Kurdan dixe. Lewma gelê Kurdistanê divê li dijî sazî û dezgehên rejîma faşîst çalakiyan li dar bixe û berxwedana ji bo rêveberiya xweser bi hêz bike."

Tîma Tolhildanê yên Şehîd Roza Botan jî derbarê çalakiya ku li dar xistin e wiha gor: "Bi hişmendiya ku wê hebûna gelê Kurd bi şerê bi şoreşgerî yê gel pêk were, 14'ê Tebaxê li Taxa Seyrantepe navçeya Bismil a Amedê, saet di 21.00'an de li dijî depoya avê ya ku qeyûm dest daye ser çalakî li dar xistiye û 13'ê Tebaxê jî li navçeya Seyrantepe ya navçeya Bismilê ya Amedê saet di 23.00'an wan de çalakiya nivîsandina nivîsandina hatiye kirin."

# ’Hêzên navneteweyî li ser xwîna gelan bazarê dikin’

Emîna Bîrem diyar kir ku ji bo têkbirina dagîrkeriyê amade ne û got, Hêzên navneteweyî li ser xwîna gelan bazarê dikin. Dewleta tirkî jî li ser tevayiya herêmê xeter e û yekîtiya gelan tenê dikare vê xeterê ji holê rake.

**Mihemed Xanim /Şahba**

Ji destpêka şoreşa Rojava ve dewleta tirkî ya dagîrker bi riya çeteyên DAIŞ’ê êrişî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê kir. Piştî têkçûna DAIŞ’ê li bakur û rojhilatê Sûriyê, Tirkiye bixwe êriş dike. Dewleta tirkî û çeteyên wê di dema êrişên dagşrkeriyê yên li ser Serê Kaniyê, Girê Spî û Efrînê de li dijî sivîlan bi dehan komkujî kirin. Niha jî bi teybetî kesayêtên walatparêz û fermandarên li dijî DAIŞ’ê şek kirîn û serkeftin bi dest xistîn, dike amanc. Li ser gef û êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser herêmên Rêvberiya Xweser, Endama Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD), Emîna Bîrem ji me re axivî.

Emîna diyar kir ku dewleta tirkî bi êrişan dixwaze îradeya gelên herêmê bişkîne û wiha got: “Êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dewam dikin, lê her dem şêwazên êrişên xwe diguherîne. Ev demek e ku dagîrkerî bi balafirên bêmirov êrişî bakur û rojhilatê Sûriyê dike û welatî, kesayetên welatperwer û berxwedêrên Rojava dike amanc. Li hemberî van kiriyarên nemirovî, hêzên navneteweyî bêdeng in û em vê bêdengiya wan şermezar dikin.”

**‘Pêngava Sondê rima di dilê xayînan de ye’**

Emîna da zanîn ku gelên herêmê heta dawî piştgiriya QSD’ê dikin û wiha got: “Piştî êrişên dagîrkeriyê yên dawî, QSD’ê li dijî xayşn û sîxuran Pêngava Sondê ragihand. Armanca vê pêngavê parastina gelên herêmê ji êrişên bêexleq yên dewleta dagîrker e. Ji bo wê divê gelên herêmê piştgiriya QSD’ê bikin da tevayiya xayîn û sîxurên dewlata tirkî ya dagîrker werin cezakirin. Ne sîxurên dewleta tirkî tenê, sîxurên rêjima Şamê, Rûsya û Îranê jî li herêmên me hene. Ji ber wê divê gelên herêmê hişyar bin û ji bo eşkerekirina van kesan alîkariya QSD’ê bikin.”

**’Rûsya, Îran û Tirkiyê li dijî vîna gelan lihev kirin e’**

Emîna bal kişand ser civînên di navbera Rûsya, Îran û dewleta tirkî yên derbarê êrişên Tirkan yên ser herêmê û wiha got: “Dibe ku Rûsya û Îranê di civînên dawî de, êrişên Tirkiyê yên ser bakur û rojhilatê



Sûriyê êrê kiribin. Lê dagîrkerî li gorî demê, xwe amade dike û dibe ku êrişeke berfereh bike. Tirkiye dixwaze di binê navên cuda yên wekî Mîsaqa Milî û Herêma Ewle de, projeyên xwe yên dagîrkirinê pêk bîne.”

**’Hêzên navneteweyî li ser xwîna gelan bazarê dikin’**

Emîna da xuyakirin ku hêzên navnetewyî ji bo berjewendiyên xwe yên aborî çavê xwe digirin û li hemberî kiryarên Tirkiyê xwe bêdeng dikin û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Tikiye dixwaze pirsgirêkên xwe yên hundir derxe derveyî sînorê xwe û bi sloganên şofînîst dixwaze gelên Tirkiyê bixapîne. Dagîrklerî di nava mehekê de li her derê komkujî kirin. Welatiyên Iraqî li Zaxo kirin amanc û gelek welatiyan jiyana xwe ji dest da. Herwiha fermandarên YPJ’ê ku di şerê DAIŞ’ê de pêşengî kiribûn, kirin amanc. Li Zirganê ya girêdayî bajarê Til Temir êrişeke hovane kir û di encamp de hin welatî şehîd û birîndar bûn. Herwiha li Qamişlo zarok û hêzên Erka Xweparastinê kirin amanca êrişên xwe û du zarok şehîd bûn. Tevî ku dagîrkerî gelek komkujiyan dike jî, Rûsya û Amerîka ji bo berjewendiyên xwe bêdeng in. Hêzên navneteweyî li ser xwîna gelan bazarê dikin. “

**’Wê rêxistinbûna gelên herêmê şkandina dagîrkeriyê teqez bike’**

Endama Meclisa Giştî ya Pratiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Emîna Bîrem bang kir ku gelên herêmê, partiyên siyasî û rêxistinên civakî li ser bingehp Şerê Gel yê Şoreşgerî xwe xurt bikin û axaftina xwe wiha qedand: “Ji gelên herêmê tê xwestin ku xwe birêxistin bikin û piştgiriya hêzên xwe yên leşkerî bikin. Li ser bingehp Şerê Gel yê Şoreşgerî, xwe ji êrişên demdirêj re amade bikin. Ji her kesî tê xwestin ku tevlî têkoşîna rûmetê bibe. Lewra ji bilî jiyaneke azad li ser xaka xwe, li ti derên cîhê jiyanê ji me re nemaye.”

# ’Rêber Apo çavkanya jiyana Azad e’

**Şaho Gabar / Qamişlo**

**15’ê Sibata 1999’an, bi komployeke navneteweyî, Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dîl hat girtin û ji aliyê hêzên komploger ve radestî dewleta tirkî ya faşîst hat kirin.**

Ji ber ku Rêber Apo nûnertiya berxwedan, azadî û demokrasiyê ji bo gelên Rojhilata Navî bi giştî û gelê Kurd bi taybetî dike, dagîrkeran li ser desthilatdariya xwe xeter didît. Rêber Ocalan 23 sal in li girava Îmralî di tecrîdeke giran de ye.

Têkildarî mijarê Endamê Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Ebdihadî Ehmed ji me re axivî. Ehmed diyar kir ku dewleta tirkî bi konsepta şer re tecrîdek girankirî li Îmralî li hemberî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dimeşîne û wiha got: “Felsefeya Rêber Apo ji cîhanê tevê re bûye felsefeya çareseriya pirsgirêkên Rojhilata Navî. Ji bo wê em gelê rojavayê Kurdistanê dibînin ku projeya çareseriyê ya Rêber Apo, li hemberî desthilatdaran alternative e. Ev felsefe û fikrê azad yê Rêber Apo, xeterê li ser berjewendiyên van sîsteman çêdike. Ji ber wê tevayiya hêzên navnetweyî di tecrîda rêbertiyê de hevkar in.”

**‘Em hêza xwe ji projeya Xweseriya Demokratîk digirin’**

Ehmed bal kişand ser bêdengiya cîhanê ya li hember tecrîda girankirî û wiha got: “Di dîrokê de tenê kesên ku fikrê wan xeterê li ser sîstemên dagîrkeriyê çêdike, tên girtin û bi cezayê giran tên cezakirin. Tecrîda li ser Rêber Apo jî ji bo wê tê kirin. Di demekê de ku gelên cîhanê li çareseriyê alozi-ya ku cîhanê dişewitîne digerin, Rêber Apo xistin nava tecrîteke bêdawî. Ji ber ku wî şêwazê çareseriya pirsgirêkan danîbû holê. Ev projeya ku ji aliyê Rêber Apo ve hatiye danîn, mînaka wê bi projeya Rêveberiya Xweser re li bakur û rojhilatê Sûriyê hatiye rêxistinkirin û li seranserê cîhanê deng vedaye. Lê Tirkiye û dewletên hevkarên wê dizanin ku ev proje xeterê li ser planên wan yên li dijî gel, çêdike. Ji ber wê tecrîdeke girankirî li ser dimeşînin.”

**‘Divê em li afirînerê felsefeya çareseriyê xwedî derkevin’**

Endamê Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Ebduhadî Ehmed bang li gelên herêmê kir ku li rêberê mirovayiyê xwedî derkevin. Herwiha da zanîn ku projeya Netweya Demokratîk çareseriya pirsgirêk û qeyrana



cîhanê giştî ye û axaftina xwe wiha qedand: “Projeya Rêber Apo ya Neteweya Demokratîk, gavbigav di şoreşa rojavayê Kurdistanê de pêk tê. Ev jî bi xwe re projeya sîstemên sermayedar bin dixe. Ji bo azadiya Rêber Apo divê her kes xwe berpirs bibîne. Rêber Apo ne yek ji yekan e. Ew xwediyê nirx û felsefeyekê ye. Eger em bixwazin ji vê qeyrana heyî derkevin divê em li afirênerê felsefeya çareseriya vê qeyranê xwedî derkevin. Em gelê rojavayê Kurdistanê di gelek mijaran de deyndarên Rêber Apo ne.”



## Riya serkeftinê ya yekane

**Dilyar Cizîrî**

Di van rojan de ku em pêşwaziya salvegera 38’an ya pêngava 15’ê Tebaxê pêngava vejîn û jinûve zindîkirina gelê Kurd yê ji pencên qirkirinê rizgar bûyî dikin.

Li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê rewşeke awerte heye. Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê ji ber êrişên dewleta Tirkan ya dagîrker yên ser welatiyên herêmê, çi bi top û obûsan, çi bi balafirên bi-çek yên bêmirov, rewşa awerte ragihandiye. Di heman demê de Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) di çarçoveya parastina rewa de li ser sînor li dijî panzer û nuqteyên artêşa Tirkan çalakî kirin. Li gorî daxuyaniya QSD’ê di çalakiyên dîmenên wan hatîn weşandin de, 29 leşker hatine kuştin û birîndar jî hene.

Li vir ezê gotina Rêber Apo ya li ser 15’ê Tebaxê ku dibêje em bi şerê xwe hene, bîr bînim. Rêber Apo hebûn û berxwedana gelan bi şerê wan ve girê dide. Di vir de Rêber Apo şer di warê leşkerî tenê de pênase nake, dibêje bingeh şerê çekdarî ye. Ji her aliyê civakê jî dixwaze li gorî hêza xwe beşdarî nava şer bibin û piştgiriya şervanan bikin. Rêbertî vê bi bingehê Şerê Gel yê Şoreşger ve girê dide.

Çima min di vê nivîsê de xwest balê bikşînim ser van xalan? Berî niha dewleta Tirkan û serokê wê Erdogan bi navê ewlekariya xwe ya neteweyî her gef li herêmên me dixwarin û dibêje ‘emê êriş bikin’. Ez careke din vegerim ser çalakiyên tolhildanê yên QSD’ê ku eşkere ji raya giştî re bi dîmen hatin ragihandin. Dibe ku li gorî hin kesan, ji dewleta Tirkan re bibe behane, lê ya rast dewleta Tirkan êdî hesabê xwe beramberî berxwedana gelê bakur û rojhilatê Sûriyê mezin dike. Ne bakur û rojhilatê Sûriyê tenê, berxwedana li Şengalê û berxwedana li Zap, Metîna û Avaşîn ji hev ne qut in. Êriş hemû di çarçoveya yek konsebtê de pêk tên. Armanca dewleta Tirkan jî bi wan êrişan, qirkirina gelê Kurd û pêkhateyên din e.

Ji bo wê piştî 38 salan ya Pêngava 15’ê Tabexê îro careke din dîrok, xwe dubare dike. Ruhê berxwedana li Rojava, Şingal û çiyayên azad berdewama fîşeka yekê ya fermandar Egîd e. Ji bo wê di serî de gelê Kurd ji gelên herêmê tevan tê xwestin ku, bi bîr û bawerî nêzî ruhê berxwedana 15’ê Tebaxê bibin û li ser wî bingehî têkoşîna xwe xurt bikin.

Eger em niha dibînin ev çend roj in êrişên dewleta Tirkan bi taybetî bi balafirên bêmirov hinekî kêm bûne, sedema wê opersyona Sondê ya QSD’ê û çalakiyên bersivdayînê ne. Eger zor û zext li herêmên dagîrkirî yên wekî Serê Kaniyê, Ezaz, Bab û deverên din çêbûne jî, piştî çalakiyên QSD’ê rewş 180 dereceyî hatiye guhertin.

Di vir de careke din em vegerin ser ruhê 15’ê Tebaxê. Lewra ji gelê me tê xwestin li ser wî hîmî, xwe baş birêxistin bike û jiyana xwe li ser bingehê Şerê Gel yê Şoreşger birêkûpêk bike.



# `Divê em herêmên dagîrkirî rizgar bikin û planên Tirkiyê pûç bikin`

Walatiyên Til Temir li dijî plan û êrişên dewleta tirkî gotin, divê em gelê herêmê bi hev re bajarên dagîrkirî rizgar bikin, planên dewleta dagîrker pûç bikin û rê nedin dagîrkeriya wê.

**Darîn Silê/Til Temir**

Derbarê êrişên dagîrkeriya Tirkî yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê de, herwiha berxwedana gel û hevgirtina wan li dijî êrişan, welatiyên bajarê Til Temir ji me re axivîn û diyar kirin ku ti carî dev ji xaka xwe û erkê xwe yê walatparêziyê bernedin.

Hevserokê Şaredariya Gel ya bajarê Til Temir Mihemed Baqî Kûtê da zanîn ku dewleta tirkî ya dagîrker ji ber binketin û lewazbûna xwe êrişên xwe yên li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê girantir kirine û axaftina xwe wiha domand: “Ji ber ku dewleta Tirkî ya dagîrker li herêmên parastina medya bi ser neket û derbên giran ji gerîlayên azadiyê xwarin, êrişên xwe yên li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê zêde kirine. Herwiha ji ber ku çiraya kesk di pêkanîna êrişeke nû de negirt, êrîşên xwe yên ku bi ruya sîxuran dike zêde kirine. Bi balafirên bêmirov welatiyên herêmê, kesayetên fermandar û leşkeran dike amanc û hewl dide vîna gelê herêmê bişkîne û wan dûrî welatparêziyê bixe. Lê welatparêzî di xwîna me de ye, ne dagîrkeriya Tirkî, ne jî hêzên cîhanê nikarin me dûrî welatparêziyê bixin.”

**`Wê serkeftin ya me be`**

Mihemed Kûtê got, em dizanin ku armanca dewleta dagîrke ne Kurd tenê ne, lewra gelek pêkhate li ser vê xakê bi Kurdan re dijîn. Her kes dizane ku dagîrkeriya Tirkan dijmina dîrokî ya tevayiya gelên herêmê ye. Ji ber wê dema ku êriş dike cudayiyê naxe navbera ti kesî û nabêje ev Kurd, Ereb yan jî Sûriyan e. Ji ber wê jî armanca wê diyar e, dixwaze tevayiya gelê herêmê qir bike û destkeftiyên dîrokî yên vî gelî ji holê rake. Herwiha dixwaze herêmê ji welatiyên wê vala bike û xaka me bixe binê desthilatdariya xwe. Lê bila baş bizane ku ti caran xeyalên wê pêk nayên. Lewra gelê herêmê bi saya fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan û projeya Neteweya Demokratîk, li hev civiyane û milbimil em berxwedan û berevaniyê di ber xaka xwe de dikin. Hêza me îradeya me ye, wê serkeftin ya me be.”

**`Ji bo berjewendiyên xwe naxwazin aramî û ewleyî li herêmê çêbe`**

Mihemed Baqî Kûtê li ser bêdengiya hêzên navnetewî bi taybetî Amerîka û Rûsya wiha got: “Hebûna Rûsya û Amerîka li herêmê ji bo berjewendiyên wan e. Rewşa herêmê û gelê wê ji wan re ne xem e. Xema wan ya sereke pêkanîna berjewendiyên wan e. Ji bo wê jî tevayiya kiryarên hovane yên dewleta Tirkan ya dagîrker ku li dijî gelê herêmê pêk tîne, hevpariya wan nîşan dide. Ji bo wê jî diyar e ku naxwazin aramî û ewleyî li herêmê çêbe. Lewra eger aramî li herêmê pêk were, berjewendiyên wan namînin û êdî nikarin weke niha tev bigerin.”

Mihemed Kûtê behsa amadekariyên ji bo rewşên awarte kir û diyar kir ku amadekarî di çarçoveya çend xalan de tê kirin û wiha pê da çû: “Yek ji amadekariyên ku em li ser dixebitin rêxistinkirina gel û avakirina komîteyên taybet bi gel re ye. Perwerdekirina komîteyên tenduristiyê ya beşa lezgîn û diyarkirina erkên wan di rewşa awarte de. Herherwiha amadekirina hin komîteyên gel yên xweparastinê, da ku li kêleka hêzên leşkerî parastina bajar, zarok, pîr û kalan bikin.”



**`Bi hev re herêmên dagîrkirî rizgar bikin û planên Tirkiyê pûç bikin`**

Ji bo rizgarkirina tevayiya bajarên dagîrkirî û derxistina dagîrkeran ji herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê Mihemed Kûtê di dawiya axiftina xwe de bang li gelê herêmê kir ku, bi hev re herêmên dagîrkirî rizgar bikin û planên dewleta Tirkan pûç bikin. Herwiha rê nedin dagîrkeriya Tirkan ku armaca xwe pêk bîne û bi yekdengî û bi ruhe hevaltî û biratiya gelan tev bigerin.

**`Hevgirtina gelê herêmê destkeftiyên şoreşê diparêze`**



Endamê Meclisa bajarê Til Temir Dildar Yûsif jî bal kişand ser hevgirtina gelên herêmê û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Hevgirtina gelên herêmê destkeftiyên şoreşê diparêze. Herwiha bi saya yekîtî û hevgirtina gelan, gelek hêz û yekîneyên leşkerî li herêmê hatine avakirin; wekî Hêzên Sûriyeya Demokratîk, Yekîneyên Parastina Jinan, Hêzên Ewlekariya Hundir, herwiha meclis û komînên taxan. Ev tev destkeftiyên vê şoreşê ne û bi saya xwîna şehîdan hatine bidestxistin. Ji bo ku em van destkeftiyan biparêzin, divê em nekevin binê bandora şerê taybet û Şerê Gelê Şoreşgerî xurt bikin. Eger em Şerê Gelê Şoreşgerî pêş bixin û li kêleka şervanên xwe bisekin, emê azadiya xwe bi dest bixin û herwiha emê xeyal û palanên Tirkan jî têk bibin. Divê bê zanîn ku serkeftina me azadiya Rêber Apo ye.”

## Divê artêşa tirkî ji Sûrî bê derxistin

**Zekî BEDRAN**



**Îran, Rûsya û Tirkiyê di daxuyaniyên hevbeş de gotin, `em piştgiriya yekîtiya siyasî û erdê Surî dikin.` Li hemberî kê piştgiriya yekîtiya siyasî û yekbûna erdê Sûrî dikin? Bêguman li hemberî Kurdan û gelên bakur û rojhilatê Sûrî! Yên li ser vî erdî dijîn, welatiyên Sûrî ne. Weke Tirkan ji derve nehatine û Sûrî dagîr nekirine.**

Divê Rûsya li hemberî gelê Kurd deriyê felaketên nû veneke. Sedemên van gotinên me hene. Lewra rewşa Efrînê li holê ye. Rûsya, wê demê bi lihevkirina bi Erdogan re leşkerên xwe kişandin û ji bo êrişê qada hewayî vekir. Tirkiye bi dagîrkirina Efrînê sînordar nema. Encama dagîrkeriyê ji bo Kurdan bû feleketeke rastî. Li wir qirkirina neteweyî hat kirin. Cihên dîrokî hatin talankirin. Talan û kiryarên dijmirovî didomin. Dema dewleta tirkî kiryarên dijmirovî dikirin, Rûsya daxuyaniyek jî neda. Ji sûcûn hatîn kirin re çav û guhên xwe girtin. Herwiha 2018`an ji bakur û rojhilatê Sûrî heyeteke fireh vexwendibu Soçî. Berî civînê bi rojekê bi dewleta tirkî re li hev kirin û herêma xweser derveyî pêvajoyê hiştin. Erdoganê faşît yê Sûrî dagîr kirî li hemberî hikumeta Şamê hêza leşkerî birêxistin dikir. Pişt re pêvajoyên Astana dest pê kir. Astana xizmeta dagîrkeriya tirkî kir.

Îran, Rûsya û Tirkiyê di daxuyaniyên hevbeş de gotin, `em piştgiriya yekîtiya siyasî û erdê Surî dikin.` Li hemberî kê piştgiriya yekîtiya siyasî û yekbûna erdê Sûrî dikin? Bêguman li hemberî Kurdan û gelên bakur û rojhilatê Sûrî! Yên li ser vî erdî dijîn, welatiyên Sûrî ne. Weke Tirkan ji derve nehatine û Sûrî dagîr nekirine. Herwiha ji bo yekbûna erde Sûrî fedakariya herî mezin kirine û ser deh hezarî re şehîdên wan çêbûne. Ji bo mayîna îdareya Esed jî desteka herî mezin pêşkêş kirine. Em bifikirin ku bakur û rojhilatê Sûrî di destê DAIŞ`ê de bima, gelo rêveberiya Şamê dikariya li ser piyan bimîne? Ya ev herêm paqij kirî QSD bû. Eger Rûsya û Îran tevlî şer nebûna û destek nedabûna, jixwe rêveberiya Esed nikariya hebûna xwe bidomîne. Tirkiyê ji destpêkê ve sînorên xwe ji rêxistinên weke DAIŞ û El Nusra re vekirin. Ya Sûrî xistî nava gerînekeke xwînê, Tirkiye bixwe bû û qaşo Tirkiye li hemberî yekbûna erde Sûrî jî rêzdar e. Eger Tirkiye ji bo yekbûna erdê Sûrî rêzdar be, çima artêşa xwe paş ve nakişîne û dagîrkeriyê bi dawî nake? Ji bo dagîrkirina herêmên Kurdan dibêjin me korîdora terorê parçe kir. Emê ji Efrîn heta Dêrikê paqij bikin, bi milyonan koçberan bînin li wan herêman bi cî bikin. Li hember yekbûna siyasî û erdê Sûrî, ev çi rêzgirtine? Tuyê erdê welatekî din dagîr bikî, guhertinên demografîk bikî û li gorî keyfa xwe tev bigerî, bi sedhezaran bi navê artêşa neteweyî ya Sûrî li hemberî artêşa fermî ya Sûrî rêxistin bikî û pişt re wê bêjî ez li hember yekbûna wî walatî rêzdarim.

Tirkiye Idlibê qet nîqaş nake. Dixwaze bide jibîrkirîn û ji rojevê derkeve. Li wir rêxistinên weke El Nusra û hwd. bi salan e desthilatdariya xwe ava kirine. Bi dehhezaran hêzên wan yê çekdar hene. Cîhanê tevê ev rêxistin bi terorîstî pênase kirine. Lê ji bo Tirkiyê hebe nebe tenê Kurd in! Ew terorîst in û divê bên tinekirin. Cîhan tev dixwaze li Sûrî şer biqede, çareseriyek siyasî pêş bikeve. Erdogan dibêje; ‘min berdin ezê herim wir belav bikim’.

Rêveberiya Rûsya jî bi vê rêveberiya faşîst û dagîrker re ku ji bo Kurdan senaryoyên felaketan amade dike, bazarê dike.

Berî civîna Tehranê hin derdoran nirxandin dikirin. Yên digotin ji bo tesfiyekirina Rojava Tirkiye û Rûsya li hev kirin, ne kêm bûn. Dihat gotin, wê biryar piştî hevdîtina Îranê pêş bikeve. Wisa tê dîtin ku Îranê dagîrkeriyeke vekirî nepejirandiye. Lewra ciyê ku Tirkiye dixwaze dagîr bike derneke-ve. Lê tirkî çeteyên xwe yên çekdar û Ixwanî amade dike, bi rêxistin dike. Ev ji bo rêveberiya Şam û Îranê gefeke eşkere ye. Ew ne li dijî lêdan û lewazkirina Kurdan in. Lê Tirkiyê ev ji xwe re bes nedît. Şopa Pûtîn berneda û 5`ê Tebaxê çu Soçî. Li wir jî bazara li ser Kurdan û herêma xweser dewam kir. Wisa xuya dike ku, şehîdkirina fermandarên QSD’ê û kadroyên pêşêngên gel, li wir hatiye pejirandin. Lewra piştî hevdîtina Tehran û Soçi êrîşên Tirkiyê yên bi balafirên keşfê zêde bûn.

Li hemberî êrîşên Tirkiyê ne ji Îran ne ji Rûsya heta niha ti bertek yan jî daxuyanî nehatine. Eger Tirkiye destekê negire nikare êrişên wiha bike. Lewra artêşa Sûrî li ser sînorê Tirkiyê bi cih bûye. Rûsya ji wir dişopîne. Qada hewayî jî di binê kontrolê Rûsya de ye.

Em vê rastiyê careke bînin ziman; di cîhanê de tişta herî zalimane û neheqî, li ser çarenûsa gelekî dijminên wî bazarkirina wan û biryardayîna wan e. Mixabin li ser Kurdan ev bazar tên kirin. Rûsya, berî van hevdîtinan pirsa nêrîna Kurdan nekiriye. Li ser encama hevdîtinan jî ti agahî nedane. Me heman rewş di civîna NATO de jî dît. Erdogan Rojava û Kurd xistine rojeva NATO. Li ser endamtiya Swêd û Finlandiya hinek tişt sepandine. Hem Swêd hem jî Finlandiya pêwîstî nedîtin daxuyaniyekê bidin Kurdan. Sekreterê gîştî yê NATO weke berdevkê Erdogan daxuyanî dida. Divê êdî Rûsya faşîstekî weke Erdogan neke belaya serê gelan. Erdogan di hundir de pir tengav bûye. Ev demeke dirêj e li hemberî gerîla êrîşên giran dike. Lê ji ber berxwedana gerîla nikare encamê bigire. Dixwaze netewperestiyê bi kar bîne û biçe hilbijartinan. Ji ber wê pêwîstiya wî bi şerekî, derew jî be bi serkeftinekê heye.

Ji ber wê em ji Rûsya re dibêjin nebe şirîkê senaryonên felaketên li dijî Kurdan tên amadekirin. Divê Îran û Rûsya bi Erdogan re mijara ka kengê artêşa xwe ji Sûrî bikişîne û kengê dagîrkeriyê xelas bike biaxivin. Eger em bala xwe bidinê Tirkiye nabêje ka wê kengê dagîrkeriyê xelas bike û artêşa xwe bikişîne. Yekbûna siyasî û yekbûna erdê Sûrî bi yekbûna bakur û rojhilatê Sûrî bi rêveberiya Şamê re û bi dawîkirina dagîrkeriyê, pêkan e. Divê yên weke Rûsya giraniya xwe bidin ser vê mijarê.